

Wateyên 12 Suretên Qur'an a Pîroz

Dilazad ART



Wateyên 12 Seretên Qur'ana Pîroz

Dilazad ART

2011 Tirmeh / Nisebîn

Weşanên Zanîngeh

Zanîngeh	: 6
Rêza Kurdî / Kürtçe	: 5
e-pirtûk / e-kitap / e-book	: 5
Verger / Çeviri	: 3

***Mafê weşandinê li ser nave Weşanên Zanîngeh bi Dilazad ART re ye.
Bi awayê ku sud bide kesan û çavkanî werê nivîsandin karin kar benin.
Hûn karin jiberbigirin, zedebikin, Kopîbikin, belavbikin.***

!Helal be!

Berpirsyarê Giştî	: Dilazad ART
Edîtor	: Dilazad ART
Amadekirina Çapê	: Ridwan Xelîl
Berg û Pêl	: Zanîngeh MEDIA
Serrastkirin / Redaktor	: Nûpelda
Pisporê Zanistî	: Gulîstan Azad
Çap	: Zanîngeh Dijital Matbaası(ZDM)
Grafik	: Zanîngeh Grafik Tasarım(ZGT)
Nasîn	: Ajans Zanîngeh a Nasînê(AZN)

Çapa Dijîtal



Çapa Yekem
Nisebîn, 2010

Bo na Pêwendî, Peşnîyar, Rexne û Arîkarîya we :

e-mail	: zaningeh@hotmail.com
tel	: 0 505 235 53 24 - Dilazad ART
	: 0 505 638 61 33 - Ridwan Xelîl
web	: www.zaningeh.net

Dilazad

Li Nisêbînê hatîye dinyê.

Zanîngeha Dîjle qedand.

Le ser çand û hûner û wejeyê dixebitê.

Nivîs û helbest û lêkolînên bi kurdî û ê bi tirkî di kovarên cihê de hatine weşandin.

Yekem pirtûka helbestvan bi tirkî bi navê “Hasretin Ağıtlar Yakılasıdır Nûpelda’ya Ağıt” di sala 2001ê de ji hela weşanên ‘İnsanca Yaşam’ ve hatibû weşandin.

Dûyemîn pirtûka nivîsakar ‘Destana Evînê’ bi kurdî di sala 2010a de ji hela weşanên ‘Zanîngeh’ ve hatibû weşandin.

Berhemên nivîskar

- 1- Hasretin Ağıtlar Yakılasıdır Nûpelda’ya Ağıt (Bi Tirkî) 2001
- 2- Destana Evînê (Bi Kurdî) 2010
- 3- Taşa Yazı Yazmak (Bi Tirkî) 2010 (e-pirtûk)
- 4- Ramanên Azad (Bi Kurdî) 2010 (e-pirtûk)
- 5- Rîsala Aborîye (Wegera Kurdî) 2010 (e-pirtûk)
- 6- Wateyên 12 Suretên Qur’an a Pîroz(Wegera Kurdî) 2010 (e-pirtûk)

*Ez vê pirtûkê
diyarî hemû evîndarên
Qur'ana Pîroz Dikim*

...

-Wateyên-
-12 Seretên-
-Qur'ana Pîroz-

-ji waneyên (dersên)-
-tefsîra Qur'an a Pîroz-
-hatine berhevkirin -

سورة الناس

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

قُلْ أَعُوذُ بِرَبِّ النَّاسِ {1} مَلِكِ النَّاسِ {2}
 إِلَهِ النَّاسِ {3} مِنْ شَرِّ الْوَسْوَاسِ الْخَنَّاسِ {4}
 الَّذِي يُوَسْوِسُ فِي صُدُورِ النَّاسِ {5}
 مِنَ الْجِنَّةِ وَالنَّاسِ {6}

Suretê Nas (Mirovan) - 6 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Bêje, ez xwe dispêrim Rabbê mirovan,
- 2- Xwedîye mirovan,
- 3- Xwedayê mirovan,
- 4- Ji nebaşîyê/xerabîye şeytan ê ku bi dizîka weswesê dikê,
- 5- Ku weswesê dixê nav sînga/dilê mirovan,
- 6- Ji ê cinnî û mirovî.

Wateya Tekuzkirî: Bibêje: 'Ji nebaşîyê şeytanê ku bi dizîka weswesê dikê û ji weswesê ku cin û mirov dixine dilê yekî de ez xwe dispêrim Rabb û Xwedî û Xwedayê mirovan.'

سورة الفلق

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

قُلْ أَعُوذُ بِرَبِّ الْفَلَقِ {1} مِنْ شَرِّ مَا خَلَقَ {2}
 وَمِنْ شَرِّ غَاسِقٍ إِذَا وَقَبَ {3}
 وَمِنْ شَرِّ النَّفَّاثَاتِ فِي الْعُقَدِ {4} وَمِنْ شَرِّ حَاسِدٍ إِذَا حَسَدَ {5}

Suretê Felaq (Berbang) - 5 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Bêje, ez xwe dispêrim Rabbê berbangê,
- 2- Ji nebaşîyê/xerabîye afirandîyan,
- 3- Ê ji nebaşîyên şeva reş tarî ya ku belavdibê,
- 4- Ê ji nebaşîyên pîfkêrê girêkan,
- 5- Ê ji nebaşîyên hesûda dema hesûdiyê dikin.

Wateya Tekuzkirî: Bibêje: 'Ji nebaşîye afirandîyan û ji nebaşîyên şevên tarî ku belavdibin û ji nebaşîyên pîfkêrê girêkan û ji nebaşîyên hesûda ku hesûdiyê dikin ez xwe dispêrim Rabbê Berbangê.'

سورة الإخلاص

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

قُلْ هُوَ اللَّهُ أَحَدٌ {1} اللَّهُ الصَّمَدُ {2}
 لَمْ يَلِدْ وَلَمْ يُولَدْ {3} وَلَمْ يَكُنْ لَهُ كُفُوًا أَحَدٌ {4}

Surêtê Îxlasê (Bawerîya Ji Dil) - 4 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Bêje, Ew Xweda yek e.
- 2- Xweda ne hewceyî tu kesîye, lê her kes hewceyî Wî'ye.
- 3- Ne zaye (ne kes ji Wî çêbuye) û ne hatiye zayîn (ne ji kesî çêbuye).
- 4- Hebûnek/tîştekek wek Wî ê bi tikûtenê ninê.

Wateya Tekuzkirî: Bibêje 'Ew Xweda Yek e. Her kes hewceyî Wî'ye Ew ne hewceyî tu kesîye. Ew ne zaye û ne hatiye zayîn. Tîştekek û hebûnek û ti kes wek Wî ê bi tikûtenê nîne.'

سورة المسد

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

تَبَّتْ يَدَا أَبِي لَهَبٍ وَتَبَّ {1} مَا أَغْنَىٰ عَنْهُ مَالُهُ وَمَا كَسَبَ {2}
 سَيُضْلَىٰ نَارًا ذَاتَ لَهَبٍ {3} وَأَمْرَأَتُهُ حَمَّالَةَ الْحَطَبِ {4}
 فِي جِيدِهَا حَبْلٌ مِّن مَّسَدٍ {5}

Suretê Tebbet (Hişkbunê) - 5 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Hişkbibe, her du destên Ebu Leheb, hişkbûn jî
- 2- Karnakê jî wî re malê wî û tiştê ku bidest xistiye
- 3- Paldaye pêta agirê ku bi pêl
- 4- Pîreka wî ya ku hamaltîya dara dikê
- 5- Di qirika wê de werîsê ji dara xurma

Wateya Tekuzkirî: Hişkbibê her du destên Ebu Leheb, hişkbûn jî. Ne mal û ne tiştê ku bidestxitine ji Ebu Leheb re kar nakê. Ebu Leheb paldaye pêta agirekî bi pêl. Pîreka wî jî hamaltîye dikê, di qirika wê de werîsê ji dara xurma heye.

سورة النصر

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

إِذَا جَاءَ نَصْرُ اللَّهِ وَالْفَتْحُ {1}
 وَرَأَيْتَ النَّاسَ يَدْخُلُونَ فِي دِينِ اللَّهِ أَفْوَاجًا {2}
 فَسَبِّحْ بِحَمْدِ رَبِّكَ وَاسْتَغْفِرْهُ إِنَّهُ كَانَ تَوَّابًا {3}

Suretê Nasr (Alîkarî) - 3 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Dema alîkarîya Xwedê û fetha/biserketina Xwedê werê
- 2- Tê bibînê ku mirov kom kom tevli dînê Xwedê bibin
- 3- Tesbîh û pesnê Rabbê xwe bike. Jê efû bixwaze, mîsoger Ew tewba dipêjirênê.

Wateya Tekuzkirî: Dema alîkarî û biserketina Xwedê hat, Tê bibînê ku mirov kom bi kom tevli olê Xwedê bibin. Naxwe ji bo vena Rabbê xwe tesbîh bikê û pesnê Rabbê xwe bide. Ji Rabbê xwe efû bixwaze. Xweda mîsoger tewba dipêjirênê.

سورة الكافرون

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

قُلْ يَا أَيُّهَا الْكَافِرُونَ {1} لَا أَعْبُدُ مَا تَعْبُدُونَ {2}
 وَلَا أَنْتُمْ عَابِدُونَ مَا أَعْبُدُ {3} وَلَا أَنَا عَابِدٌ مَّا عَبَدْتُمْ {4}
 وَلَا أَنْتُمْ عَابِدُونَ مَا أَعْبُدُ {5} لَكُمْ دِينُكُمْ وَلِيَ دِينِ {6}

Surete Kafîrûn (Nebaweran) - 6 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Bêje, ey gelî kafirno/nebawerno
- 2- Ez perêstinê nakim ê ku hûn perêstin dikin
- 3- Ê hûn jî perêst nekin ê ku ez perêst dikim
- 4- Ê ez jî îbadet nakim ê ku hûn jê re îbadetê dikin
- 5- Ê hûn jî îbadetê nekin ji ê ku ez jê re îbadetê dikim
- 6- Olê we ji were, olê min ji min re.

Wateya Tekuzkirî: Bibêje: 'Ey gelî kafirno. Ez perêstinê nakim ji ê ku hûn perêstinê jê re dikin. Hû jî perêstîne nekin ji ê ku ez perêstina Wî dikim. Ez îbadetê nakim ê ku hûn jê re îbadetê dikin. Hûn jî îbadetê nekin ji ê ku ez jê re îbadetê dikim. Olê we ji were, olê min ji min re.

سورة الكوثر

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ
 إِنَّا أَعْطَيْنَاكَ الْكَوْثَرَ {1} فَصَلِّ لِرَبِّكَ وَأَنْحَرْ {2}
 إِنَّ شَانِئَكَ هُوَ الْأَبْتَرُ {3}

Suretê Kewser (Hewzê Kewser) - 3 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Misoger Me Kewser da te
- 2- Ji bo Rabbê xwe, nimej bike û bigurêne
- 3- Misoger ê ku bê wert ewin ku li hember te tên.

Wateya Tekuzkirî: Misoger Me Kewser da te. Tu, ji bo na vena ji Rabbê xwe re nimej bike û Qurbanê bigurêne. Misoger ê ku bê wertin ewin ku li hember te derdikevin.

سورة الماعون

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

أَرَأَيْتَ الَّذِي يُكَذِّبُ بِالْإِيمَانِ {1} فَذَلِكَ الَّذِي يَدْعُ الْيَتِيمَ {2}
 وَلَا يَحْضُ عَلَىٰ طَعَامِ الْمِسْكِينِ {3} فَوَيْلٌ لِلْمُصَلِّينَ {4}
 الَّذِينَ هُمْ عَنْ صَلَاتِهِمْ سَاهُونَ {5} الَّذِينَ هُمْ يُرَاؤُونَ {6}
 وَيَمْنَعُونَ الْمَاعُونَ {7}

Suretê Ma'un (Hewcedariye Malê) - 7 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Te dît ewê ku ol înkarkir
- 2- Ewê ku sêwîya dafdidê
- 3- Û ji mîskîna re/hêjaran re teşvîqa xwarinê nakê
- 4- Wey li wanê ku nimej dikin
- 5- Ewin ê ku nimeja xwe jibîrdikin
- 6- Ew kesin ji bo ku bên dîtîn
- 7- Û qedexedikin alîkariye/hewceye tiştê malê

Wateya Tekuzkirî: Te dît ewê ku ol/Roja Qiyametê înkardikê. Te dît ewê ku sêwîya dafdidê û berdidê sêwîya û ew kes ji mîskîna re teşvîqa xwarinê nakê. Wey li wanê ku nimej dikin. Ew kesin ku nimeja xwe jibîrdikin, nimeja xwe dereng dihêlin. Ew kesin ku nimeja xwe ji bo ku mirovên dî wa bibînin dikin û dema ku hewcedariyek dikevê alîye wa alîkariye li mirovan nakin.

سورة قريش

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

لِإِيلَافِ قُرَيْشٍ {1} إِيلَافِهِمْ رِحْلَةَ الشِّتَاءِ وَالصَّيْفِ {2}
 فَلْيَعْبُدُوا رَبَّ هَذَا الْبَيْتِ {3}
 الَّذِي أَطْعَمَهُمْ مِنْ جُوعٍ وَآمَنَهُمْ مِنْ خَوْفٍ {4}

Suretê Qurêyş - 4 Ayet e.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Ji bo Qureyşî ji hev hezkirin
- 2- Ji bo hezkirina wa karwanê zivistan û havînan
- 3- Ji ber wena îbadetê bikin ji Rabbê vî xanî (Kabê) re
- 4- Ew Xweda ye ku ji birçibunê xwarin daye we û ji tirsê ewleyî daye we

Wateya Tekuzkirî: Ji ber ku hezkirin û hevbendî bi kevê nava Qureyşîyan, karwanê wa hem zivistana (diçûn Yemenê ji ber ku germ bu) û hem havînan (diçûn Şamê ji ber ku hînik bu) diketin rê. Naxwe ji ber vî nîmetê ku Xwedê daye we ji Rabbê vî xanî (Kabê) re îbadetê bikin. Ew Xweda ye ku hun (Qureyşî) ji birçibunê xilaskir/ xwarin da wa û ji tirsê ewlayî da wa.

سورة الفيل

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

أَلَمْ تَرَ كَيْفَ فَعَلَ رَبُّكَ بِأَصْحَابِ الْفِيلِ {1}
 أَلَمْ يَجْعَلْ كَيْدَهُمْ فِي تَضْلِيلٍ {2} وَأَرْسَلَ عَلَيْهِمْ طَيْرًا أَبَابِيلَ {3}
 تَرْمِيهِمْ بِحِجَارَةٍ مِّن سِجِّيلٍ {4} فَجَعَلَهُمْ كَعَصْفٍ مَّأْكُولٍ {5}

Suretê Fîl - 5 Ayete.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Ma te dît Rabbê te çi kir ji xwedîyen filan
- 2- Ma ne planên/dolavên wa pûçkir/vala derxist
- 3- Ref ref teyrê Ebabîl şiyand bi ser wa de
- 4- Kevirên ji herîye di avetîn ser wa
- 5- Û ew kirin wek qirşiken şikestî

Wateya Tekuzkirî: Te dît bê Rabbê te çi kir ji xwedîyen filan. Xwedê plan û dolavên wa puçkirin û vala derxistin. Xwedê bi ser wa de ref ref teyrê Ebabîl şiyandin. Ebabîlan kevirên ji herîyê di avetîn xwedîye filan. Xwedê xwedîye filan mîna qirşikên şikestî binketî kirin.

سورة الهمزة

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

وَيْلٌ لِّكُلِّ هُمَزَةٍ لُّمَزَةٍ {1}

الَّذِي جَمَعَ مَالًا وَعَدَّدَهُ {2} يَحْسَبُ أَنَّ مَالَهُ أَخْلَدَهُ {3}

كَلَّا لَيُنْبَذَنَّ فِي الْحُطَمَةِ {4} وَمَا أَدْرَاكَ مَا الْحُطَمَةُ {5}

نَارُ اللَّهِ الْمُوَقَّدَةُ {6} الَّتِي تَطَّلِعُ عَلَى الْأَفْئِدَةِ {7}

إِنَّهَا عَلَيْهِمْ مُّوَصَّدَةٌ {8} فِي عَمَدٍ مُّمَدَّدَةٍ {9}

Suretê Humezet (Tinazker) 9 Ayete

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Weyl li kesên ku sebê dikin û bi çava tinaza dikin
- 2- Ew na mal kom dikin
- 3- Mîsoger bawer dikin ku yê mal wa nemirkê
- 4- Na, ewê bête avetin nav Hudame
- 5- Ma tu dizanê Hudame çiye
- 6- Agirê Xwedê yê ku geş û ku pêlên we levdikevê
- 7- Ew agir hildibê bi ser dil de
- 8- Mîsoger agir yê li ser wa ê pêçandin
- 9- Bi stûnen direj ve.

Wateya Tekuzkirî: Weyl li kesê ku sebê dikin û bi çavên xwe henekê xwe li mirovan dikin. Ew kes mal kom dikin. Ji wa were yê mal wa nemirkê. Na, ew kes yê bête avetin nav Hudame. Tu dizanê bê Hudame çiye? Hudame; agirê Xwedê ê geş û ê ku pêlên wî levdikevin. Ev agir hildibe bi ser dilê wa kesa we. Mîsoger agir yê mîna stûnen direj li wa bê pêçandin.

سورة العصر

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

وَالْعَصْرِ {1} إِنَّ الْإِنْسَانَ لَفِي خُسْرٍ {2}
 إِلَّا الَّذِينَ آمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ وَتَوَاصَوْا بِالْحَقِّ وَتَوَاصَوْا بِالصَّبْرِ {3}

Suretê Esr (Danê Êvarê / Heyam) - 3 Ayete.

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Sond bi danê êvarê / bi heyamê.
- 2- Mîsoger mirov di xisarê de ne
- 3- Ne kesên ku rastîye/maf û sebrê/hedanê ji hev re şîretdikin.

Wateya Tekuzkirî: Sond bi danê êvarî. Mîsoger mirov di xisar û ziyane-
 nedeye. Kesên ku rastîye û hedan li hev şîret dikin ne di xisar û ziyane-
 dene.

Spasî:

Ji bo dersdayîn û alîkarîye ji

Mela Mihammed

re zor spas.

Hişyarî:

Ez ne mela me, ne jî zaneyê Qur'anê me. Tenê xwendekarim. Lê agirekî li dilê min xistiyê. Tenê ê ku bi vî agirî canê wî disojê têdigihê armancamin. Ger xeletî û şaşîtî û nerastî di vê nivîsê de hebê daxwaza min ewê ku ji hela zanaya ve verê serrastkirin. Bi destura Ellah yê berdewama vê xebatê verê. Xebat ji min, serkeftin ji Ellah'e.

Bi hevîya duayên we...

Dilazad

Suretê Nasr

Bi Navê Ellah ê Rahman û Rehîm

- 1- Dema alîkarîya Xwedê û fetha/biserketina Xwedê werê
- 2- Tê bibînê ku mirov kom kom tevlî dînê Xwedê bibin
- 3- Tesbîh û pesnê Rabbê xwe bike. Jê efû bixwaze, mîsoger Ew tewba dipêjirênê.

Wateya Tekuzkirî: Dema alîkarî û biserketina Xwedê hat, Tê bibînê ku mirov kom bi kom tevlî olê Xwedê bibin. Naxwe ji bo vena Rabbê xwe tesbîh bikê û pesnê Rabbê xwe bide. Ji Rabbê xwe efû bixwaze. Xweda mîsoger tewba dipêjirênê.

